Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :476 www.ronahi.net/ku/ 26- Cotmeh - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî







# Li Helebceyê Mihrîcana Hinaran destpê kir

5. Festîvala Hinaran li parêzgeha Helebceyê destpê kir. 200 cotkar berhemên xwe yên hinaran pêşkêş dikin.
5.Festîvala Hinaran li bajarê Helebceyê destpê kir. Festîval bi amadebûna hêjmarek zêde welatiyan û berpirsên bajêr destpê kir. Her wiha wê festîval îro jî dewam bike.
Festîvala Hinaran ji aliyê Tora Rêxistinê Helebce, bi hevkariya çend şîrket û Wezareta Çandiniyê tê rêxistinkirin.
Di festîvalê de nêzî 200 cotkarên Helebce, Hewreman û Şarezor bi hinarên xwe beşdar dibin. Di festîvalê de berhemên din yên çandiniyê jî tê nîşandan.
Organîzatorê Festîvalê jî diyar kir ku ew pêşbînî dikin ku di 2 rojan de 20 hezar kes beşdarî festîvalê bibin... ***ROJNEWS***

# Jin baştir futbolê dilîzin



Lîstîkvanên Tîma Futbolê ya Vedeng derbarê Futbolê de nêrînên xwe anîn ziman. Lîstîkvanên Futbolê yên jin diyar kirin ku ew li dijî hişmendiya ku dibêje 'Jin nikare' li qadan bersiv didin.
Li navçeya Girkêlegê bajarê Dêrîkê yê Kantona Qamişloyê di meha tebaxê de cara yekem Tîma Jinan a Futbolê ya bi navê Vedeng hat avakirin. Tîma Futbolê ji 11 jinan pêk tê.
Lîstîkvanên Futbolê têkîldarî futbolê de axivîn û gotin ku ew bi bîrdoziya jinê li qadan têdikoşin.
Lîstîkvan Solîn Ehmed diyar kir ku avakirina tima futbolê ya jinan bi hemû jinan re kelecaneke mezin afirand û wiha got: "Bi rastî wekî jinên ciwan avakirina Tîma Futbolê ya Jinan bi me re kelecanek û moralekî mezin afirand. Avakirina tîma futbolê di heman demê de ji jinan re di werzîşê de pêşiya derfetên nû vekir. Di futbolê de her tim mêr hebûn, lê me ev hişmendî şikand û me nîşanda ku werzîş ne tenê ya mêran e. Bawerî bi hêza jinan nehat ji ber wê futbol li gorî civaka serdest karê mêran bû. Di futbolê de jin ji mêran serkeftî û jêhatir in. Ji ber ku jin gelek estetîk dilîzin."
Lîstîkvan Emel Silo jî bang li hemû jinên ji futbolê hez dikin kir û diyar kir ku bi xwe bawer bin em dikarîn û wiha dewam kir: "Di jiyanê de werzîş ji bo tendûristiya mirov pir girîng û baş e. Ez ji zarokatiya xwe de û heta niha futbolê dilîzim. Lê wek îro derfet tunebûn ku ez di tîmekê de bilîzim. Her jinek di tîmê de îradeyek e. Jin di futbolê de pir serkeftî û jîr in. Hêvî dikîm ku em di futbolê de bigihîjîn astên herî bilind. Bila her jinek hezkiriya futbolê bê tevlî me bibe û em bi hev re hêza jinê nîşan bidin."...***JINNEWS***

# Tovê genim wê li Minbicê were belavkirin

Odeya Çandiniyê ya girêdayî Komîteya Aborî wê li Minbicê tovê genim yê dermankirî û mazotê ji bo çandiniyê belav bike.
Odeya Çandiniyê ya girêdayî Komîteya Aborî li Minbicê ji bo demsala çandiniyê ya sala 2019'an ew ê tovê genim yê dermankirî li cotkarên Minbicê belav bike. Nirxê tov wek 160 lîreyên Sûriyê hatiye diyarkirin.
Tê payîn ku Odeya Çandiniyê tov di destpêka meha Mijdarê de belav bike.
Li gorî Odeya Çandiniyê li Minbicê ku cureyên bêne belavkirin doma 4 û qasî ne.
Ji bo ku nexweşî nekeve nava berhemên çandiniyê û taybet genim, Odeya Çandiniyê 350 kîlogram tov ji her hektarekê re diyar kiriye. Li gorî daneyên odeyê, wê li herêma Minbicê derdora 2 hezar hektar erd bê çandin.
Hevserokê Odeya Çandiniyê yê Minbicê Cemîl Mihemed diyar kir ku Odeya Çandiniyê ji bo hemû pêdiviyên cotkaran amade ye...***ANHA***



Ronahî
şopdara rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 476 26- Cotmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## QSD`ê derbên giran li DAIŞ`ê xist



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) bi daxuyaniyekê encamên şerê 24 saetên dawî yê "Şerê Tunekirina Terorê" eşkere kir. QSD'ê diyar kir ku li eniyên Baxoz û Hecînê di navbera şervanên wan û çeteyên DAIŞ'ê de şerên giran qewimîne û da zanîn ku di encama şerên li li van her du eniyan de 37 çete hatine kuştin.***R-2***

# ÊDÎ DEMA AVÊTINA GAVÊN SIYASÎ YE

**Ev 5 salên dawiye Kurd li Sûriyê ji bo hemû Cîhanê şerê terora herî xedar dikin. Kurdan di şerê li dijî rêxistinên weke El Nusra û DAIŞ'ê de bi berxwedaneke mezin rûmeta mirovahiyê parastin. Lê tevî vê jî heta niha di warê naskirina statuya siyasî ya Bakurê Sûriyê de ti gaveke siyasî nehatiye avêtin.**




## TEVLÎ CIVÎNAN NEHATIN KIRIN

Heta niha ji bo qaşo aloziya Sûriyê çareser bibe gelek civîn di asta navnetewî de hatin lidarxistin. Lê hêza sereke ya Sûriyê yanî hêzên Bakurê Sûriyê beşdarî van civînan nehatin kirin. Ji bo ku şer û aloziya li Sûriyê çareser bibe û Sûriyeke nû ya demokratîk bê ava kirin Hêzên Bakurê Sûriyê gelek projeyên çareseriyê pêşkêş kirin.


## SERDANA JEFFREY A BAKÛRÊ SÛRIYÊ

Şandeyeke peyabilind ya DYE'yê ya bi serokatiya Nûnerê Taybet yê DYE'yê ya Sûriyê James Jeffrey bi armanca lêkolînkirina rewşa herêmê û şêwazên tevlêbûna Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê û MSD'ê di gotûbêjên destûra Sûriyê û beşdarbûna Cinevê serdana herêmêm Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir.

## EM NIHA GAVÊN SIYASÎ DAVÊJIN

Hat diyar kirin ku James Jeffrey destnîşan kiriye ku ew ji bo tevlêbûna Rêveberiya Xweser û Meclîsa Sûriya Demokratîk ya danûstandinên Cenevê û tevlêbûna amadekirina destûra nû ya Sûriyê de dixebitin. Hat gotin ku Jeffrey destnîşan kiriye ku ew çawa di aliyê leşkerî de şirîkê QSD'ê bûn niha jî gavên siyasî davêjin. ***R-4***

## Ala Şoreşa Cotmehê li Rojava li ba dibe



Tevgera Şoreşê a Yekbûyî ya Gelan (HBDH) ji ber salvegera Şoreşa Cotmehê daxuyaniyeke niviskî da. HBDH'yê salvegera Şoreşa Cotmehê silav kir û got, "Ala ku ji Şoreşa Cotmehê hatiye girtin li Şoreşa Rojava li ba dibe. Li dijî emperyalîst, mêtinger, dagirkeran, parastina Şoreşa Rojava, tê wateya xwedîderketina li mîrateya Şoreşa Cotmehê." ***R-4***

## Gelê Kurd êdî bê tifaqiyê qebûl nake

18. Kombûna Civata Giştî ya Kongreya Netewî ya Kurdistanê KNK'ê wê 26-28'ê, Cotmehê li Hollanda bi beşdariya zêdetirî 300 endam û mêvanan pêk were. Di civînê de wê tîfaq û yekîtîya Kurd were nîqaş kirin. Hevseroka KNK'ê Nîlûfer Koç diyar kir ku êdî gelê Kurd bê tifaqiyê qebûl nake. KNK'ê projeyek amade kiriye û wê pêşkêş bike." ***R-4***

## Kesê piştî De Mistûra divê liser destûrke nû bixebite

Hevseroka Meclisa Giştî ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Sîham Qeryo di derbarê îstîfaya Nûnerê Neteweyên Yekbûyî yê Sûriyê Staffan De Mistura û kesê ku li şûna wî were erkdarkirin, de axivî û diyar kir kesê ku piştî De Mîstura bê erkdarkirin divê li ser Destûreke Bingehîn a nû bixebite. ***R-4***

## Kurd û dostên wan ji bo Rêber Ocalan dadikevin qadan




Ji bo azadiya Rêber Ocalan li Ewrûpa, Kanada, Avûstralya , Japonya û li gelek navendan were lidarxistin. KCDK-E banga tevlûbûna meşan kir. KCDK-E'yê diyar kir ku si ser Ocalan tecrîdeke giran heye û ev tecrîda li Îmraliyê li tu dera cîhanê tune ye û got, "rakirina tecrîda li ser Rêber Apo û geşkirina têkoşînê wezîferya demokratbûn û şoreşgeriyê ye." ***R-2***

## Jineolojî di dibistanan de mijareke sereke ye



Li dibistanên bakurê Sûriyê jineolojî weke mijareke sereke ya perwerdê ye. Eleqeya li hember zanîsta jineolojiyê roj bi roj zêde dibe. Komîteya Perwerdehiya Civaka Demokratîk xala jineolojî weke mijareke sereke xist nava materyalên dibistanên Bakurê Sûriyê. Endama Komîteya Perwerdehiyê Nûpel Îzedîn diyar kir ku wan li ser pêdiviya civakê xala jineolojî li materyalên perwerdeyê zêde kirine. ***R-3***

## Piştî şerê sar tetbîqata herî mezin a NATO'yê destpêkir

NATO ji salên 1980'î û vir ve tetbîqata herî mezin a bi navê "Trident Juncture 18" pêk tîne. Tetbîqatê li cihekî nêzî sînorê Rûsyayê destpê kir û wê 31 dewlet tevlî bûne. Her wiha 50 hezar leşker, 250 balafir û 10 hezar tank wê tevlî tetbîqatê bûne. Tê gotin armanca tetbîqatê ji bo xurtkirina kapasîteya şer e û wê 2 hefteya dewam bike. ***R-2***



# DAIŞ hê jî li ser Sûriyê û Iraqê xetere

**Berdevkê Koalîsyona Navnetewî ya li dijî DAIŞ'ê Kolonel Sean Ryan diyar kir ku tevî berdewama pêngava leşkerî ya li dijî DAIŞ'ê ku êdî tenê li hin deveran dorpêçkirî maye, dîsa jî car bi car êrîşan li Iraq û Sûriyê pêk tîne û got, "Em li rex hevkarê xwe QSD'ê hewl didin devera herî dawî ya di bin dagirkeriya DAIŞ'ê de ye rizgar bikin."**

DAIŞ hê jî li ser Sûriyê û Iraqê xetere

Tevî ku DAIŞ'ê serweriya xwe li piraniya herêmên Sûriye û Iraqê winda kiriye, lê hê jî dikare êrîşên dijwar li dijî welatiyên sivîl pêk bîne. DAIŞ ji aloziya Sûriyê, ji tevliheviya siyasî ya Iraqê û ji piştgiriya dewleta Tirk sûd werdigire.




Berdevkê Koalîsyona Navnetewî ya li dijî DAIŞ'ê Kolonel Sean Ryan ji Radyoya Dengê Amerîka re axivî û diyar kir ku tevî berdewama pêngava leşkerî ya li dijî DAIŞ'ê ku êdî tenê li hin deveran dorpêçkirî maye, dîsa jî car bi car êrîşan li Iraq û Sûriyê pêk tîne û got, "Ev terorîst hê jî dikarin li dijî hêzên koalîsyonê û hevkarên wê yên li ser erdê êrîşan pêk bînin.

Ryan destnîşan kir ew dizanin ku hin berîkên biçûk di destên DAIŞ'ê de li Sûriyê û Iraqê mane, DAIŞ hewl dide binesaziya sivîl hilweşîne da ku nîşan bide ew hê jî li herêmê hene û wiha dewam kir: "DAIŞ hê jî li geliyê çemê Firatê heye. Em li rex hevkarê xwe QSD'ê hewl didin devera herî dawî ya di bin dagirkeriya DAIŞ'ê de ye rizgar bikin".

Berdevkê Koalîsyona Navnetewî ya li dijî DAIŞ'ê Kolonel Sean Ryan diyar kir tişta bala wan dikişîne hêza di destên DAIŞ'ê de li deverên di bin serweriya wê de ye û got: "rojane li rex hejmareke kuştiyên DAIŞ'ê em miqdareke cebilxaneya wê desteser dikin. Ev mijar jî gelekî girîng e".

## Êrîş hatin şikandin, gelek çete hatin kuştin



Çeteyên DAÎŞ'ê li Dêrazorê êrîşî çeperên şervanên QSD'ê kirin. Şervanên QSD'ê êrîşa çeteyên DAÎŞ'ê şikandin û di şer de gelek çete kuştin.

Pêngava Bagera Cizîrê ya bi navê Şerê Tunekirina Terorê berdewam dike. Di navbera şervanên QSD'ê û çeteyên DAIŞ'ê de şerên giran rû didin. Şervan derbên giran li çeteyan didin û pêşdeçûna xwe didomînin.

Çeteyan bi bahoza xîzê re xwestin li eniya Baxoz û Hecînê êrîşî çeperên şervanên QSD'ê bikin. lê şervanan ev êrîşa çeteyên DAÎŞ'ê şikandin.

Di van şeran de li eniya Hecînê herî kêm 10 cenazeyên çeteyan ketin destê şervanên QSD'ê û hate ragihandin ku li eniya Baxozê jî gelek çete hatin kuştin.

Li her du eniyan gelek wesayîtên leşkerî yên çeteyan ên bombebarkirî hatin teqandin.

Li eniya Hecîn û Baxozê şer didome.

## Piştî şerê sar tetbîqata herî mezin a NATO'yê destpêkir

Tetbîqata mezin a NATO'yê roja Pêncşemê bi navê "Trident Juncture 18" li Norwêcê dest pê kir. 31 dewlet wê tevlî bûne.

Tetbîqat wê li cihekî nêzî sînorê Rûsyayê tê kirin. 50 hezar leşker, 250 balafir, 10 hezar tank, kamyon û wesayitên din ê leşkerî wê tevlî tetbîqatê bûne.

Serheng Eynsteîn Kvarvîng ji Reûtersê re axivî û diyar kir ku hêzên tevlî tetbîqatê bibin li şûna xwe bi cih bûne. Kvarvîng got, ji bo xurtkirina kapasîteya şer wê tetbîqat du hefteyan bidome.



Navê 'Trîdent Jûnctûre' li tetbîqatê hate kirin. Ji salên 1980'î û vir ve tetbîqata herî mezin e ku li Norwêcê tê kirin.

Bi vê tetbîqetê re tê îdîakirin ku NATO wê qada parastina leşkerî xurtir bike.

Tê îdîakirin ku tetbîqat di fermiyetê de li dijî ti hêzê nayê kirin. Lê fikar nîne ku hedef Rûsya ye.

## Gêrîla li Colemêrgê li leşkerên Tirk xist



HPG'ê li ser çalakiyên gerîla yên li Colemêrgê agahî da û diyar kir ku herî kêm 3 leşkerên Tirk hatine kuştin.

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên gerîla yên rojên dawî daxuyaniyeke nivîskî weşand.

Di daxuyaniyê de ev agahî hatin dayin: "Roja 24'ê Cotmehê saet 14:30'î hêzên me li dijî artêşa TC a dagirker ku li ser Girê Pêşmerge yê li herêma Govendê ya navçeya Şemzînan a Colemêrgê bi cih bûbû, çalakiyek pêk anîn. Ji du baskan ve li kozikên leşkerên dijmin hate xistn û di encamê de 2 leşkerên dijmin hatin kuştin.

24'ê Cotmehê saet 13'an, hêzên me li dijî leşkerên dijmin ên li Qereqola Şikêr a li navçeya Çelê ya Colemêrgê çalakiyeke sûîqestê kirin. Di vê çalakiyê de leşkerek hate kuştin.

Roja 25'ê Cotmehê saet 01:00 balafirên şer ên artêşa TC a dagirker bombe li derdora gundên Lêlîkan û Benasenanê yên herêma Sîdekanê ya Başûrê Kurdistanê barandin. Ji ber bomberdûmanê tiştek bi gerîlayên me nehat, lê xisar li dehl û rezên gundiyan bû."

## QSD`ê derbên giran li DAIŞ`ê xist



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya QSD`ê bi daxuyaniyekê destnîşan kir ku hêzên wan di çarçoveya qonaxa dawîn a Bagera Cizîrê ya bi navê Şerê Tunekirina Terorê de derbên giran li DAIŞ`ê xistin.

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) bi daxuyaniyekê encamên şerê 24 saetên dawî yê "Şerê Tunekirina Terorê" eşkere kir. QSD'ê diyar kir di nava 24 saetên dawî de 37 terorîst hatine kuştin.

Di daxuyaniyê de ev agahî hatin parvekirin:

**ENIYA BAXOZ**

Di 24'ê mehê di saetên şevê de terorîstan êrîşî nuqteyên şervanên me kir. Şervanên me bersiva êrîşên wan da. Di encamê de 17 terorîst hatin kuştin. Balafirên şer ên Koalîsyona Navneteweyî jî baregehên terorîstan kirin hedef û erebeyeke bombebarkirî hate teqandin û ajokarê wê hate kuştin. Her wiha di eniyên paş de tevgera terorîstan hate şopandin. Şervanên me tevgerên wan kirin hedef û di encama wê de hêjmarek terorîst hatin kuştin.

Ji aliyê din ve jî terorîstan êrîşî nuqteyên şervanên me kir. Şervanan bersiva êrîşan da û di encama wê de hêjmarek terorîst hatin kuştin û gelek çek û cebilxane ketin destê şervanên me. Di şerê li wê eniyê de 4 şervanên me şehîd bûn û çend şervan jî birîndar bûn.

**ENIYA HECÎN**

Şervanên me êrîşên terorîstan têk birin. Di navbera şervanên me û terorîstan de şerekî dijwar rû da. Di encama wê de kuştî û birîndar ji terorîstan çêbûn. Li wê eniyê şer hê dewam dike.

Encamên şer

37 terorîst hatin kuştin, 13 baregehên terorîstan hatin rûxandin, 9 nuqteyên terorîstan hatin rûxandin û erebeyeke ku doçkaya 23 li ser bû, hate teqandin. Balafirên Koalîsyona Navneteweyî 14 caran êrîş pêk anîn. Koalîsyonê 18 moşek ji cureya Hymers avêt baregehên terorîstan.

## Kurd û dostên wan ji bo Rêber Ocalan dadikevin qadan



Ji bo azadiya Rêber Ocalan li Ewrûpa, Kanada, Avûstralya , Japonya û li gelek navendan were lidarxistin. KCDK-E banga tevlûbûna meşan kir.

Dîwana Hevserokatiya KCDK-E'yê bernameya meşên ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan eşkere kir.

KCDK-E'yê diyar kir ku rakirina tecrîda li ser Rêber Apo û geşkirina têkoşînê peywira demokratbûn û şoreşgeriyê ye.

KCDK-E'yê di daxuyaniya xwe de got, "Li ser Ocalan tecrîdeke giran heye. Ev tecrîd û îzalosyona li Îmraliyê li tu dera cîhanê tune ye. Ji Rêber Apo em tu agahiyan nastînin. Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê, CPT û saziyên din bêdeng in. Tecrîda li ser Rêber Apo, tê wateya tecrîdkirina gelên Kurdistanê. Rêber Apo ne bi tenê rêberê gelê Kurd e, di heman demê de bi fikrên xwe hêvî û rêberê gelên cîhanê ye jî. Li Rojhilata Navîn gelek gel Rêber Apo ji xwe re rêber dibînin. Rêber Apo, li hemû parçeyên Kurdistanê rêberê neteweyî ye. Rêber Apo ew ê ew ê bi têkoşîna gelê Kurd, gelên ku baweriyê bi fikrên wî tînin û bi têkoşîna ronakbîr û rewşenbîran ew ê azad bibe. Em bang li Kurd û dostên wan ên li Ewrûpa, Kanada, Avûstralya, Japonya û gelek navendên din dikin ku bila tevlî meş mîtîngan bibin.



# Pêşnegeha wêneyan a "Ez li vir im" vebû

**Komeleya Ronahiya Pêşerojê ya Xêrxwaziyê bi dirûşmeya"Ez li vir im" li bajarê Minbicê pêşengehek vekir. Bi dehan welatiyên Minbicê û endamên rêveberiyê û saziyan beşdarî merasîma vekirina pêşengehê bûn. Di pêşengehê de wêneyên ji Minbicê hatin pêşandan.**



Komeleya Ronahiya Pêşerojê ya Xêrxwaziyê bi dirûşmeya"Ez li vir im" li bajarê Minbicê pêşengehek vekir.

Pêşengeh li Kafeterya Erd El-Seîde ya rojavayê çerxerêya Sebi Behrat a bajarê Minbicê hate vekirin.

Bi dehan welatiyên Minbicê û malbatên zarokên ku tevlî pêşengehê bûne, endamên sazî û komîteyên Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbicê û Gundewarên wê, di vekirina pêşengehê de amade bûn.

Pêşengeh bi axaftina rêveberê komeleyê Ehmed El-Faxûrî destpê kir. El-Faxûrî bi xêr hatina beşdaran kir û mekanîzmaya xebatên komeleyê şirove kir. Paşê deriyê pêşengehê ji aliyê hin zarokan ve hate vekirin.

Piştre, beşdar derbasî nava pêşengehê bûn li wêneyan temaşe kirin. Her wiha kart li ser hemû beşdaran hate belavkirin da ku ji nava wêneyan 5 wêneyên baştir hilbijêrin. Piştre wê encam werin diyarkirin û xwediyê wêneyên baş werin xelatkirin.

Li gorî berpirsên komeleyê zarokên ji malbatên feqîr ku komele destekê dide wan, cihê xwe di vê pêşengehê de girtine. Destpêkê zarokên ku wênekêşiyê hez dikin, 35 zarok hatin hilbijartin û dewreyeke perwerdê li ser wênekêşiyê ji wan re hate vekirin.

Zarokên ku tevlî pêşengehê bûne jî hejmara wan 30 zarok e û wêneyên ku di pêşengehê de hatin pêşandan hemû ji bajarê Minbicê ne…*ANHA*

## *Civîna salane ya Kaevana Zêrîn*

**Melek DEMÎRTAŞ**

Bi armanca nirxandina xebatê salekê yê Navenda Çande û Hunera Kevana Zêrîn ku di 20'ê Cotmehê de li navenda çand û hunera Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişlo civîna salana ser asta Herêma Cizîrê hate li darxistin.

**MECİLSA TENG Lİ HEV CİVİYAN**

Têkîldarê mijarê Endama Qoordînasyona Kevana Zêrîn a Bakurê Sûriyê Rûken Mihemed ser xebat û pilansziya ku civîna salane ev agahî dan ku beriya du mehan Meclisa teng a Kevana Zêrîn ji 7 kesan pêk tên ji herêmên wekî Cizîrê, Şehba, Tebqa, Reqa û Kobanê civiyan û tekmîla xebatê salekê hate kirin û Rûken wiha pêde çû: "Ser wê bingehê jî dê li gorî pilansaziyê gerek di 8 Cotmehê de li Şehbayê, 13 Heleb serdan bikra lê ji ber derfetên rê nebû. Lê di 9 û 10 Cotmehê de serdna Minbicê hate kirin û li wir wekî navenda Kevana Zêrîn hîn tam nehatiye rêxistinkirin; jiber ku xebat xweser di nav yê giştî de lewaz meye. Da ku derbas bikin di milê ferast de em perwerde bidin, piştre em derbasî Kobanê bûn li wir jî bi rêvebirên xweser e niqaş hatin kirin diyar bû ku li Kobanê xebatê çandê bi rengekî baş hatiye meşandin, lê di warê danesîna Kavenê Zêrîn delawaz me, lê ya bal hate kişandin ku li hind navçeyên Kobanê de navendên Kevanê hatin vekirin ev cihê kêfxweşiyê bû. "

**PİRANİYAN PİRAYAR PÊK HATİN**

Rûken da zanîn ku civîna salê di 17 mehê de li kobanê çêbû û wiha got:"Di civînê de hate biryar girtin, da ku Herêmên Tebqa û Girê Sipî di warê xebatê hunerî taybet yên xweser de bê rêxistinkirin. Jiber ku li Tebqayê hijmarek ji 20 jinan heye û xwe wekî Kevana Zêrîn didin nasîn û di asta mamoste û akadimî kar dikin, da ku ew hişmendiya qalibçî bişkînin projeyên nû têne kirin. Her wiha di 20'ê Cotmehê de Li Kantona Qamişlo û Hesekê ji bo civînê li hev civiyan û biryarên ku di konferansê hatibûn girtin heya astekê hatin bi cih anîn."



Rûken biryar diyar kir ku biryarên ku pêk hatin evin: (Bi pêşngitiya Kevana Zêrîn Mihrîcana zarokan, hemleyên ji bo Rêbertî wekî rojên hunerî, Tundiya ser jin şano û filim ser çand rojan hate lidarxistin, her wiha şahî, şevbêrk û stran ser jiyan serokatî û wekî jinên kevana zêrîn stran ji bo Efrîn hatin lidarxistin.) Biryarên ku pêk nehatin û di sla bêde dewam bikin jî evin: (Arşîva hemû şehîdên jinên çandê, her wiha ji bo Ş.Viyan Peyman ku di berxwedaniya kobbanê cihe girtibû, li kobanê wekî biryar hatibû girtin ku di salvergar wê de, şevbêrkên hunerî û dengbêjî bên lidrxistin, her wiha belgefîlim ser dengbêjan çêbikin, di heman demê de vestîvala taybet bi jinê bi navê Ş.Berçem çêbikin lê pêk nehatin. ji bo biryarên nû jî têkîlî di navebra Kevana Zêrîn û Jineolojî de xurtbikin, jiber ku cihên dîrokî hene da bi hevre lêkolîn û binivîsînin, her wiha hemleya ku ciwanên şoreşger a bi navê "Dijî kabtalîzimê xwedî li cil û bergên xweyî resen derkevin" rabûne em wekî kevana zêrîn tevlî vê kampaniya yê bin, hemelya ji bo azadiya rêbertîcdewam bike, komîteyak perwedê dê heftiyê carekê perwerdê ser jin di rûpelên dîrokê de, jin û malbat, jineolojî, çawa bijîn û netewa dîmokratîkcbidin."

**Dİ WARÊ DANESÎNA XWEERİYÊ DE LAWAZ MEYE**

Rûken bal kişand ser gavên hatine avêtin û kêmaniyên derbas kirine û wiha raber kir: "Wekî vê salê xebat û çalakiyên hunerî û perwerdeyên hunerî baş hatin kirin, heya hijmarek baş ji tevlî bûna jinan û taybet yên zarokan tevlî bûn çêbû. Lê di milê xwe îfadekirin, naskirin û xwesertiya xwe di nav xebatên giştî de parastin lawaz me, ku di akadimiya Ş.Welat a çand û huner de di vê salê du perwerdeyên xweser hatin li darxistin, her wiha di dewreyên din jî 18 hevalên jin çihê xwe tê de girtin heye astekî baş bû lê pêwîste di warê parastina xwesertiyê têbikoşin. Ji bo wê jî di navenda kevana zêrîn de sê mamostên şano û govendê ku ser mîmik û zimanê laş da pêşbixin bi mehan perwerd dan, her wiha dewreyên mûzîk wekî erbana, saz, gîtar û solfêc hat dayîn. Niha jî ser du mehan perwereya mûzîk hatiye vekirin mamoste Amir ji Başûrê Kurdistanê hatiye ku perwerdê dide 12 jinan."

Endama Qoordînasyona Kevana Zêrîna Bakurê Sûriyê Rûken Mihemed di dawî de bi bîrxist ku Bi armanc piştgirya Efrîn û ji bo azadiya Rêbertî dê çalakiya meş bi cil û bergeên gelerî ser asta herû kanrotna Qamişlo û Hesekê li bajarê Amûdê bi piştgiriya Kevana zêrîn di 9'ê Mijdarê de lidarbikeve."

## Keleha Paşa li benda nûkirinê ye



Keleha Paşa ku weka koşka Mihemed Paşayê Caf tê nasîn, yek ji cihên diyar, dîrokî ya Germiyan û Kurdistanê ye. Dîroka vê kelehê digihêje sed sala 19'an. Heya niha nehatiye nûkirin û pêwîstî bi nûkirinê heye.

Bi taybet li Başûrê Kurdistanê gelek cihên dîrokî hene, gelek ji van cihan jî kelehin. Keleh pirranî di dema şeran de hatine çêkirin, herwiha ji ber ku cografyaya Kurdistanê çiyayiye bûye cihê şer û pêşbaziyan jî. Keleha Paşa ya li Germiyan yek ji wan kelehên dîrokî ye.

Keleha paşa dikeve aliyê Rojhilatê gundê Tazedê, ew jî nêzîkî 10 kîlometre ji Bakurê Rojhilatê bajarokê Kelar ya ser bi navenda Herêma Germiyan dûre. Ev keleh di nava newalekê de hatiye çêkirin, beşê bakur, rojhilat û rojavayê kelehê bi gir û bilindahiyê girtiye.

Keleha Paşa ji aliyê Mihemed Paşayê kurê Mihemed Paşayê Keyxusrî Begê Caf ve ku di nava salên 1846-1921'an de jiyaye, hatiye çêkirin. Li gorî dîroka Mihemed Paşa, dîroknas û şûnwar, dîroka vê kelehê digihînin navbera salên 1882-1874'an.

Li gorî dîroknasan navê wê 'Keleha Paşayê Kanî Çeqel'e. Piştî wê xelkên navçeyê navê wê kirine 'Keleha Paşa' û wisa hatiye nasîn. Heya niha jî xelkên wê navçeyê bi wî navî kelehê didin nasîn.

Di sala 2010'an de weke 'Koşka Mihemed Paşayê Caf' hatiye nasandin. Şûnwara Keleha Paşa ji 2 beşan pêk tê; beşa sereke dikeve newalê li aliyê Rojhilat. Ev keleh ji 2 qatan pêk tê û xwedî 8 odeyane. Herwiha 2 hol û dîwanxaneyek mezin jî di nav kelehê de ne. Her 2 qat jî aliyê binesaziyê dişibin hev, beşa dûyem jî bi gir ve kirine yek û girekî xwezayî çêkirine. Beşa dûyem ji odeyek biçûk û dîwaxaneyekê pêktê.

Di çêkirina kelehê de zêdetir kevir û herî bikarhatiye. Lê li hinek cihan jî dar jî bikar hatiye. Di aliyê binesaziyê de jî li beşa serekî ya kelehê 5 pencere hene. Ji bilî wê jî di hinek cihan de jî kozikên agir hene.

Heya niha ev keleh nehatiye nûkirin, niha metirsiya xirab bûnê li ser vê kelehê heye. Lê hê jî girîngiya xwe ya dîrokî ji dest nedaye. Ger were nûkirin, dikare bibe cihekê geştiyariyê û bala kesên geştyar bikşîne.

Li ser girîngî nedayîna vê kelehê rêveberê şûnwaran a Germiyan Şukrî Mihemed got; "Beriya qeyrana aborî me amadekariyên nûkirinê kiribûn. Lê mixabin piştî qeyrana aborî ev hemû kar hatin rawestandin. Bê guman wê piştî qeyranê ev keleh were nûkirin."…*ROJNEWS*

# Şaredariyê gelek projeyên xizmetê pêk anî

**Şaredariyên Bakurê Sûriyê tevî zehmetî û derfetên kêm jî xebatên xwe yên xizmeta gel berdewam dikin. Şaredariya Gel a Girê Spî jî di çarçoveya xebatên xizmetê de gelek projeyên ku danîbû pêşiya xwe pêk anî. Şaredarî ji bo projeyên ku nehatine temam kirin jî xebatên xwe didomîne.**

Şaredariya Gel a Girê Spî gelek projeyên ji bo xizmeta gel pêk anîn. Her wiha şaredariyê gelek projeyên nû jî daniye pêşiya xwe.
Şaredariya Gel a Girê Spî di demên dawîn de gelek projeyên xizmetê yên mîna çêkirina toreyên kanalîzasyonê û sererastkirina rêyan pêk anîn.
Bi hatina demsala zivistanê re şaredariyê hemû projeyên xwe pêk anîn. Toreyên kanalîzasyonê, sererastkirina rêyan û çerxerêyên di nava bajêr de sererast kirin.
Şaredariya Gel projeya cihê çêkirina qîrê ya nêzî 6 hezar û 900 metrekabik pêk anî. Rêya ji Eyn Arûs heta gundê El-Sikeriye, rêya Goristana Şehîd Mehmûd Tamê û hinek rêyên din jî hatin sererastkirin.
Ji aliyê din ve şaredariyê heta niha nêzî 6 hezar metrekabik kevirên şikandî bi buhayê 20 milyon lîrayên Sûriyê danîn. Li gorî berpirsên di şaredariyê de proje ber bi bidawîbûnê ve diçe.
Her wiha şaredariyê projeyên din ên xizmetguzariyê jî pêk anî.
Ji wan projeyan, sererastkirina deriyê veguhestina bajarokê Eyn Arûs heta Çerxerêya Asayîşê ye. Her wiha çerxerêya şaredariyê bi buhayê 265 hezar lîreyan sererast kir. Her wiha gelek projeyên din mîna sererastkirina toreya ronîkirina bajar û peydakirina sindoqên çopê pêk anîn.
Di çarçoveya projeyên şaredariyê yên pêşerojê de hevserokê Şaredariya Gel a Girê Spî Abdulrezaq El-Xemîs axivî û destnîşan kir ku wê di demên pêş de sûka sebze û fêkiyan vekin. El-Xemîs diyar kir ew bi hevkariya Buroya Fenî li ser diyarkirina cihê sûkê dixebitin da ku pêwîstiyên welatiyan pêk bînîn. El-Xemîs destnîşan kir piştî ku cih were diyarkirin wê herêmeke sînaî vekin û diyar kir ku ew li hêviya pereyan in da ku dest bi projeyê bikin.
Abdulrezaq El-Xemîs di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku derbarê çemê Selûleh de gelek gazinc hene, ji ber wê wan projeyek daniye pêşiya xwe da ku vê pirsgirêkê çareser bikin…*ANHA*




## Nexweşxaneya Niştîmanî serê salê dest bi xizmetê dike

Komîteya Tenduristiyê ya Meclisa Sivîl a Reqayê bi armanca xebatên xizmeta tenduristiyê gelek navendên tenduristiyê vekirin.
Komîte niha xebatên Nexweşxaneya Niştîmanî birêve dibe û tê payîn ku di destpêka sala bê de ev xebat bi dawî bibe.
Piraniya nexweşxane û navendên tenduristiyê yên bajarê Reqayê 4 salên dawî di encama hovîtiya DAIŞ'ê de, wêran bûbûn.
Li bajarê Reqayê 39 navendên tenduristiyê hatin talankikirin û wêran kirin.
Piştî ku şervanên QSD'ê bajarê Reqayê rizgar kir, Meclisa Sivîl a Reqayê dest bi xebatên tendurustiyê kir. Meclisê bi armanca xizmeta tenduristiyê gelek navendên tenduristiyê û yekîneyên gerok vekirin.
Ji destkeftiyên komîteyê yên herî girîng vekirina navenda bankeya xwînê ya bi navê Seyf El-Dewla li navenda bajêr e.
Serokê Komîteya Tenduristiyê yê Meclisa Sivîl a Reqayê Ehmed Ismaîl diyar kir ku xebatên restorekirina Nexweşxaneya Niştîmanî berdewam dike û diyar kir ku nexweşxane wê di destpêka sala 2019'an de dest bi xebatê bike… *ANHA*



## Sererastkirina Pira Kevn ber bi dawîbûnê ye

Piştî xebatên 4 mehan, Meclisa Sivîl a Reqayê projeya sererastkirina Pira Kevn a Reqayê ber bi dawiyê ve dibe. Ev pir rêya yekane ya di navbera bajarê Reqayê û gundewarên wê de ye.
Meclisa Sivîl a Reqayê projeya sererastkirina Pira Kevn a Reqayê didomîne.
Piştî xebatan, meclisê beşa çîmento bi dawî kir. Li gorî cîgirê berpirsê projeya sererastkirinê, beşa mezin a ku hatiye çêkirin hatiye ceribandin û tu pirsgirêk piştî sererastkirinê derneketine.




Niha werşeyên kar dest bi amadekirina beşa hesinî bi dirêjahiya 20 metreyan kirine û ew beşa herî xeternak e, ji ber ku li ser çemê Firatê ye. Werşeyên kar ji bo ku karibin bi hêsanî xebatên sererastkirina pirê bimeşînin, aliyê herikîna çem ber bi başûr ve guhertin.
Têkildarî mijarê cîgirê berpirsê projeyê Ebdilrehman El-Hesen wiha got: "Em dixebitin da ku pirê vegerînin mîna berê."
El-Hesen got pir baş û qewîm çêbuye û got: "Piştî ku sererastkirina pirê bi dawî bibe, dive barê ku di ser pirê re were derbaskirin ne zêdetirî 4 tonan be."…*ANHA*

## Meclîsa Lihevanînê hate avakirin

Komîteyên lihevanînê yên Tebqa û gundewarê wê li avahiya Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Tebqayê civiyan û di encama civînê de Meclîsa Lihevanînê ya Tebqayê ku ji 5 endaman pêk tê hate avakirin.
Komîteyên lihevanînê yên Tebqa û gundewarên wê civînek lidarxistin. Di civînê de pêşketinên dawî yên siyasî û leşkerî li herêmê hatin gotûbêj kirin.
Di civînê de Endamê Dîwana Edaleta Civakî ya Tebqayê Umran Osman axivî û behsa sîstema darizandinê di serdema rêjîma Sûriyê de kir û anî ziman ku hemû welatî weke kole ji aliyê rêjîmê ve dihatin dîtin.
Osman da zanîn ku ew ê di paşerojê de Meclîsa Edaleta Civakî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ava bikin.
Di civînê de kar û xebatên komîteyên lihevanînê hatin gotûbêjkirin û piştre Meclîsa Lihevanînê a Tebqayê hate avakirin û 5 endam weke rêveberên Meclîsê hatin hilbijartin…*ANHA*



### RAMANÊ RÊBERTIYÊ



## Hevjiyana Azad -8-

**Abdulah Ocalan**

Di têkiliyên hevjiyanê de asta bê pêkanîn çiqasî zanistî, hunerî û felsefî be, ewqasî jî wê gavavêtina jiyana sosyalîst pêkan be. Ji bo sosyalîzmê, beriya her tiştî pêkanîna têkiliyên hevjiyanê, ji aliyê pratîk û prensîb ve nirxek xwe heye, mirov nikare jê bimîne. Ji bilî vî şêwazê têkiliyê, rêyeke din nîne ku mirovî bibe sosyalîzmê. Eger têkiliyên bi vî rengî hebin jî wê neyekser bin û li şaşiyan vekirî bin. Divê mirov têkiliyên hevjiyanê weke têkiliyên di navbera du kesan de fêhm neke. Fêhmkirineke bi vî rengî kêm e. Bêguman têkiliyên dualî yên hevjiyanê dikarin pêk bên, lê bi tenê bi vê yekê bê fêhmkirin rast nîne. Hevjiyan bi hêzeke mezin a manedan, estetîk û exlaqê pêk tê, ji dualîbûnê şuştî ye û bêhtir jiyaneke bi xwe û cewherî ye.
Jin û mêrên bi jiyana sosyalîst ve girêdayî, kengî jiyana azad bi awayekî gerdûnî û kolektîf pêk anîn, dikarin û şensê wan heye bi awayekî taybet jî rast û xweşik bijîn. Mirov dikare di tevahiya tevgerên mezin ên civakî yên dîrokê de vê rastiyê bibîne. Gelekî girîng e ku mirov jiyana taybet bi lîstikên zewacê û ji wê zêdetir neyênî bi şêweyên li derveyî zewacê re tevlîhev neke. Di jiyana fer û taybet de tevahiya potansiyela kolektîf û gerdûnî ya civakî veşartiye. Lê di şêweyên taybet ên kedîkirin û malbatê yên şaristanî û moderniteyê de gerdûnîtî û kolektîfîte têne înkarkirin. Mirov heta nikaribe vê yekê ji hev cuda bike, nikare jiyana azad a taybet a sosyalîstwarî pêk bîne. Di çarçoveya têkiliya sosyalîst de mêr û nexasim jî jin a bi zanistî, estetîk, exlaqî û felsefî rabe dibe xwedî hêzeke mezin a balkêşiyê. Kesayetên jin û mêrên bi vî rengî, li hemberî jiyana civakî têk naçin, berevajî bi hebûna xwe jiyana civakî ya azad ava dikin. Ji ber ku di vê cotbûna feran de bi hev ewlebûn û hurmet serdest e, cih ji nexweşiyên sîstemê yên mîna hesûdî, kaprîs, çilekî, têrnebûn û bêzarkirinê re nîne. Ji ber ku hevdu nakin milk, yek li hemberî yê din bi îdeaya heq (di huqûqa bûrjûwa de ev heye) ranabe. Hêza wan a manedanê ya di weznekê de dikare li cem kesekî/ê yekparebûnê, di yekparebûnê de jî kesekî/ê pêk bîne.
Tevgerên civaka dîrokî bi tenê bi kesayetên wisa manedar bûne, bi ser dikevin. Kesayetên bi vî rengî divê timî weke sosyalîst bêne zanîn, bîranîn û bendewariya wan bê kirin.
Ji bo pêşketina civaka sosyalîst, di warê pêkanîna teoriya hevjiyana azad de hin tecrûbeyên dîrokî hene, girîng in ku mirov wan li ber çav bigire. Xiristiyantiyê di vê babetê de jiyana rahib û rahîbeyan weke şert danîbû pêşiya kadroyên xwe. Di pêşdeçûna şaristaniya Rojava de roleke girîng a vê pêkanînê heye. Xiristiyantiyê neyêniyên civaka cinsiyetparêz bi vê pêkanîna kadroyî gelekî bi sînor kir. Ji ber ku zexta cinsî ya li ser zêhniyeta rûhî gem kiriye di pêşdebirina civakbûnê de bi roleke girîng rabûye. Lê nikarîbûye rê li ber pêşketina diyalektîkî ya hevjiyana azad gengaz dike veke; li hemberî wê weke reaksiyon cinsiyetparêziya civakî ya modernîteya kapîtalîst serî rakiriye. Hevjiyana bi yek kesî re ya milkperestiya modern, rê li ber peydabûna şêwazekî jiyanê yê dijberê çanda rahib û rahîbeyan, seriyekî duyemîn ango duqutbûnê vekiriye. Di bingehê pêxîrtengiya hevjiyana modern a yekhevalî de çanda rahib û rahîbeyan a Xiristiyantiyê heye. Ji bo ji civaka cinsiyetparêz bê bihurîn herdu çand jî xetimî mane. Di binê pêxîrtengiya çanda cinsiyetparêz a civaka Rojava de ev rastî veşartî ye.



# Jineolojî di dibistanan de mijareke sereke ye

**Li dibistanên bakurê Sûriyê jineolojî weke mijareke sereke ya perwerdê ye. Eleqeya li hember zanîsta jineolojiyê roj bi roj zêde dibe. Komîteya Perwerdehiya Civaka Demokratîk xala jineolojî weke mijareke sereke xist nava materyalên dibistanên Bakurê Sûriyê. Endama Komîteya Perwerdehiyê Nûpel Îzedîn diyar kir ku wan li ser pêdiviya civakê xala jineolojî li materyalên perwerdeyê zêde kirine.**

Bi armanca avakirina nifşekî nû ku karibe civaka xwe li gorî rêgezên netewa demokratîk birêve bibe, Komîteya Perwerdehiya Civaka Demokratîk a kantona Cizîrê madeya Jinelojî derbasî dibistanên kantonê kir.
Bi armanca avakirina civakeke ku xwe dispêre rêgezên demokratîk û ti ferq û cûdahiyê naxe navbera jin û mêran Komîteya Perwerdehiya Civaka Demokratîk madeya jineolojî derbasî hemû dibistanên Bakurê Sûriyê kirin.
Komîteya Perwerdehiya Civaka Demokratîk-Jin di konferansa xwe ya di sala 2015'an de madeya Jinelojî weke mijareke sereke xist nava materyalên dibistanan .
Di sala 2016'abn de li ser Jinelojî yekemîn car li kantona Efrînê û piştre li Kobanê hate perwerde hat dayîn, li kantona Cizîrê jî ji ber ku hejmara dibistanan zêde ye û pêdivî bi mamosteyan jî zêde ye perwerdeya madeya Jinelojî hinekî dereng ma.



Girêdayî mijarê Komîteya Perwerdehiya Civaka Demokratîk-Jin bi dehan mamoste li ser Jinelojî perwerde kirin.
Di destpêka sala 2018'an de gelek mamosteyên zimanên Erebî û Kurdî ji bo perwerdekirina Jineolojî hatin amadekirin û weke gava yekemîn refê yekemîn a dibistana amadeyî tên perwerdekirin.
Komîte bi hevkariya Akademiya Jineolojî madeya Jinelojî bi zimanê Suryanî jî amade dike.
Derbarê rêbazên perwerdeya Jinelojî de Endama Komîteya Perwerdehiyê Nûpel Izedîn Ehmed axivî û diyar ku beriya madeya Jineolojî li meteryalên dibistanan bê zêdekirin wan Jineolojî ji welatiyan re şîrove kir û di encama nîqaşan de biryar hate girtin ku madeya Jineolojî li meteryalan were zêdekirin.
Nûpel da zanîn ku armanca sereke ya perwerdeya vê madeyê ew e ku nifşekî nû xwedî exlaqên azad û li gorî rêgezên jiyana hevbeş ava bibe û wiha got: "Civaka azad bi mêrê desthilatdar û jina kole ava nabe, ji ber vê yekê Jineolojî van mijaran çareser dike."
Di çarçoveya amadekariyan û şêwazên perwerdeya Jineolojî de Endama Akademiyê Şîlan Mihemede da zanîn ku wan di destpêkê de sê mehan mamoste li ser Jineolojî perwerde kirine û niha hejmara mamosteyên Jineolojî têra dibistanên Cizîrê dikin û wiha got: "niha perwerdeya Jineolojî bi zimanên Erebî û Kurdî tê dayîn û ji bo bi zimanê Suryanî jî were perwerde bê dayîn xebat bê navber tên meşandin."
Mamosteya Jineolojî Lava Berko destnîşan kir ku di destpêkê de xwendekar bi baldarî nêzî mijarê dibûn lê niha piştî ku rastiya dîroka jinan nas kirin hejmara xwendekarên ku dixwazin Jineolojî fêr bibin zêde bûn.
Xwendekara bi navê Ayenda Hiso girêdayî mijarê wiha got: "Min gelekî dixwest ez Jinelojî bixwînim û ez lêhûrbûnên dîroka jinan nas bikim. Bi nêrîna min divê xebatên perwerdeya Jinelojî bêne zêdekirin û di hemû dibistanan de weke madeya sereke were dayîn."
Xwendekara bi navê Loranda Xelîl da zanîn ku wan bi riya Jineolojî rastiya jina azad nas kirine.

### MÊR JÎ FÊRÎ JINEOLOJÎ DIBIN

Mamosteya bi navê Muhdiyê Mihemed destnîşan kir ku di destpêkê de mêr beşdarî fêrbûna Jineolojî nedibûn, bi taybetî ji ber bandora zihniyeta baviksalariyê, lê piştî ku rastiya Jineolojî nas kirin hejmara xortên ku dixwazin Jineolojî bixwînin zêde bûye.
Xwendekarê bi navê Şiyar Hiso diyar kir ku wî piştî ku rastiya Jineolojî nas kir divê hemû xwendekar bi baldarî Jineolojî bixwînin û ji zihniyeta baviksalariyê rizgar bibin.
Endama Rêveberiyê Nûpel Izedîn di dawiyê de wiha got: "Di dawiya her hefteyê de em civînekê li dar dixin û xebatên heftê dinirxînin da ku em kêmasiyan derbas bikin."… *ANHA*

## Qordînasyona jinê çar yaneyên jinê xelat kir

**Ferîşte NEZÎR**

Qordînasyona jinê ya di Desetya Şaredariyên Herêma Cizîrê de bi tensîqkirIna Bîroya jin a di Desteya ciwan û werzîşê re, wekî alîkariya taximên werzîşê dane herçar Yaneyên ku di beşdarî Şampiyona Baskêtbolê bûbûn xelat kirin.

### MUNESİQİYA JİNÊ TAXİMÊN WEZÎŞÊ BELAV KİR

Ev cara yekemîne ku Qoordînasyona Jinê ya Desteya Şaredariyan gavek wiha di rabe û her çar yaneyên ku başdarî şampiyona baskêt bolê ya yaneyên Herêma Cizîrê bûbûn .Yaneya Serdem, Asayîşa Jin, Hesekê û Yaneya Ehlî Amûdê, ji xwe ev şampiyona ya di 20'ê Îlonê de destpê kir û di 6'ê Cotmehê de bi dawî bû. Ku di encamê de Yaneya Jinên Asayîş bi sê yaneyan re lîst û bi serkftî bi ser ket û lîgeyê şampiyonê bi dest xist. Bi vê mebestê û pêşxistina werzîşa jinê ev gav hate avêtin û xelata taximên werzîşê ji bo jinên werzîşê hate belav kirin."

### Jİ BO PÊŞKETİNA WERZÎŞA JİNÊ EV GAV NEBESE

Lê ev gav tenê nebes ji bo wêjî hêviya Destiya Jin û werzîşê heye ku hîn bêtir alîkariya bi vî rengî bê kirin û bi xebatên werzîşa jinê re badarbin da ku di qada werzîşê pêşxistin çêbibe. Ji ber ku di îasla de werzîşa jinê gavên ber pêşketin û guherinê, Ku di Kantonê de 25 yaney hene ku werzîşa jin bi avakirina yekemîn yaneya jinên werzîşê bi navê Yaneya Qendîlê gavek dîrokî avêt. Di van yaneyan de werzîşa Futbol, baskêtbol, pîngbol, Şetrenc, taykwando û karatê tê dayîn.
Hêjayî bi bîrxistinê ku di 26'ê Cotmehê roja Înê dê şampiyona Şetrencê taybet bi jinan li bajarê Qamişlo li dar bikeve, her wiha di 27'ê Cotmehê de ku roja Şemiyê ye dê şampiyona Tênis ew jî taybet bi jinê li Amûdê li dar bikeve. Ji cwe hemû yaneyên ku herêma Cizîrê de ser sîstema Hevserokatî didi meşandin."




## Bêrîtan xeta jina azad e

**Binevş SARYA**



Bêrîtan (Gülnaz Karataş) dendika artêşa jina Kurde. Mirovên ku bi jinên leheng yên pêşengên heqîqetê re jiyankirine xwediyên şansê herî mezin yê jiyanê ne. Di jiyana çiyayan de û demê herî zehmet mirov bi kesên weke Bêrîtan Hêvî re bibe heval, di wan kêliyan de jiyan xweş û hemu zehmetî li ber çavên mirovan hêsan û kêm dibin. Ez zarokbum, min jiyan an jî janên jiyanê nas ne dikirin. Cara yekem bu ku min jinên leşker û rêvebir didîtin. Di nava wan jinên leşker de yên herî zêde bala min kişandibun yek ji wan jî Bêrîtan û Binevş bun. Binevş Reşît jinek girs, bilind û xwedî hêz bû. Binevş di taxima Bêrîtanê de li ser çeka giran doçkaya 14 nîvbû. Binevş bi lehengî, xurt buyîn û hêza xwe bala min gelek dikişandi bu. Lê Bêrîtan ji bo min ji hemuyan cudatir û balkêştir bu. Ji xwe dema mirov zarokbe zu bi zu kesan nikare heta temenek mezin di hişê xwede bigire. Lê Bêrîtan ne kesek wisan bu ku mirov zû ji bîr bike, di sala 1991 de ez 5 salî bum ya rast min gelek kesên wê demê ji bîr kirine, heta ne kes min gelek bîranînên wan deman jî ji bîr kirine. Lê min tu caran ew jina leheng ya ku hemû kêliyên jiyanê tejî û dagirtî jiyan dikir qet ji bîr nekir. Ji ber ku em zarokbun û derfetên kesî nebûn ku biçin bajaran ji me re cilên zarokan bikirin gelek caran cilên mezinan ji me re danîn, biçuk dikirin û li me dikirin. Jina ku di her tiliyek wê de merîfetek hebû gelek caran di nava wan bêderfetiyan de şev li ber ronahiya fanosan an jî li ber ronahiya agirê Gerîla ya ku sebirê dide mirovan dirunişt bi tayên ku jinên leheng ji kefiyên xwe kişandibun û weke tayê dirûtinê bi kar danîn, ji mera cilên gerîla yên mezin li gorî bedena me her 6 zarokan biçuk dikir û bi derziya ku hertim di ber berîka gumlekê xwe de digerand, didirût û li me dikir. Dema ku ji me re ew cilana çêdikir û li me dikir min xwe zaroka herî kêfxweş ya di cîhanê de hîsdikir. Hîna weke duh ew kêliyane di bîra min de ne. Di wan deman de şerê 1991 an dest pêkiri bu, dewleta Tirk cara yekem bi balefiran li herêma Xakurkê didan û piştî êrîşên balefiran leşker bi lingan ketin herêmê. Cardin qehremanên jiyana min Bêrîtan û Binevş bala min dikişandin ser xwe, Binevş bi çeka xwe li dijî balefiran şer dikir û Bêrîtan jî bi lehengî moral û hêza xwe dibu hêviyên serkeftinê ji min re. Ew çend roj bun ku xwarin nebu kesek ji me bixwe, her kesî ger pariyek nan an jî tiştekî xwarinê bidîtibuya danîn didan dayika min, digotin van bide zarokan bila bixwin. Rojekê cardin qehremana xeyalên min ji berîka xwe hinek şekirê hur û qetek nanê hişk derxist, da destê dayika min û jê re got vî nanî li zarokan belav bike şekir jî tu bixwe, da tu bikaribî li ser lingan bisekinî. Cardin min bi baldarî li bedewiya wê dinêrî û min ji xwe re wiha got, dema ez mezin bibim ezê weke wê zîrek û ji mirovan hez bikim. Rojekê jina leheng ji fermandarê herêmê re pêşniyar kir ku me ji nava wî şerî derbêxin û li ser pêşniyariya wê em û dayika me derbasî gundê Sîdeka kirin. Piştî em çun û şunde jî min her lehenga jiyana xwe meraq dikir.
Rojekê sal 1992. 25. Cotmehê bû, zilamekî pêşmergê PDK ê ji herêma Xakurkê hatibu, yanî ji çeperên şerê ku li dijî gerîlayan dikirin hati bu, li mala me runişt û ji dayik û bavê min re got îro keçek we xwe ji latan avêt û şehîd ket! Dayika min bi lez jê pirsî got navê wê çibu gelo? Zilam wisan bi awayek bêhn fireh got navê wê Bêrîtan bu dema ku navê wê got di dilê me hemûyan de lehiyek ji xwînê herikî û bavê min ew zilam ji malê qewitand. Xuşka min ya biçûk ku navê wê çîçek bu temenê wê 3 salî bu serê xwe ji ser çoka dayika min rakir û got ji niha û pêde navê min Bêrîtane. Di mala me de hebuna Bêrîtanê qet kêm nebû. Ji bo me hemuyan Bêrîtan Hêviya jiyanê bû û wisan jî ma. Bêrîtan ne tenê hêviya me bu ew bu rastiya xeta Artêşa jin û xeta azadiyê ji bo tevgera gelê Kurd.

# Gelê Kurd êdî bê tifaqiyê qebûl nake

**18. Kombûna Civata Giştî ya Kongreya Netewî ya Kurdistanê KNK'ê wê 26-28'ê, Cotmehê li Hollanda bi beşdariya zêdetirî 300 endam û mêvanan pêk were. Di civînê de wê tîfaq û yekîtîya Kurd were nîqaş kirin. Hevseroka KNK'ê Nîlûfer Koç diyar kir ku êdî gelê Kurd bê tifaqiyê qebûl nake. KNK'ê projeyek amade kiriye û wê pêşkêş bike."**



Hevseroka KNK'ê Nîlûfer Koç diyar kir ku ji bo parastina destketiyên gelê Kurd, divê hemû aliyên siyasi bi erk û perpirsyariyên xwe rabin û got, "Me weke Kongreya Neteweyî projeyek amade kiriye û em ê pêşkêş bikin."
Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) 18. civata xwe ya giştî pêk tîne.
18. Kombûna Civata Giştî wê 26-28'ê, Cotmehê li Hollanda bi beşdariya zêdetirî 300 endam û mêvanan pêk were. Nûnerên partiyên siyasî û civakî, sazî, dezgeh û gelek kesayetên ji her çar parçeyên Kurdistanê û dîasporayê wê tevlî kombûnê bibin.
Rewşa siyasî û bûyerên dawî yên li Kurdistanê, Rojhilata Navîn û cîhanê diqewimin di civînê de bi berfirehî werin nirxandin.
Di civata giştî de wê yekîtî û tifaqa navxweyî jî were nîqaşkirin.
Hevseroka KNK'ê Nilufer Koç li ser armanc û naveroka civata giştî ji rojnameya Yenî Ozgur Polîtîkayê re axivî û bal kişand ser tifaq û yekîtiya neteweyî û got, "Gelê Kurd êdî siyaseta parçebûyî û bê tifaqiyê napejirîne. Ji bo parastina destketiyên gelê Kurd, divê hemû aliyên siyasî bi erk û berpirsyariyên xwe rabin. Me weke Kongreya Neteweyî projeyek amade kiriye û em ê pêşkêş bikin."

## Koalîsyona Navnetewî dixwaze MSD beşdarî Cenevrê bibe

Çavkaniyek ku beşdarî civînên şandeya Koalîsyona Navdewletî ya bi serokatiya James Jeffrey bû, diyar kir ku Koalîsyona Navdewletî ji bo tevlêbûna Rêveberiya Xweser û MSD'ê di danûstandinên Cinevê û amadekirina destûra Sûriyê de bi israr e.Şandeyeke peyabilind bi serokatiya şandeyê Amerîkayê yê Sûriyê James Jeffrey bi armanca lêkolînkirina rewşa herêmê û aramiya wê û şêwazên tevlêbûna Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) di gotûbêjên destûra Sûriyê de û beşdarbûna Cinevê serdana herêmêm Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir.
Li gor nûçeya ANHA'yê çavkaniyên tevlî civînên li bajarên Minbic, Eyn Îsa û Reqayê hatine lidarxistin bûne diyar kirin ku şandeyê peyama piştgiriya bi Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê da ye.
Hat gotin ku şandeya Amerîkayê di hevdîtinan de destnîşan kiriye ku koalîsyon wê piştgiriya xwe ya di aliyên siyasî û leşkerî de bidomîne.
Çavkaniyan diyar kirin ku James Jeffrey destnîşan kiriye ku ew ji bo tevlêbûna Rêveberiya Xweser û Meclîsa Sûriya Demokratîk ya danûstandinên Cenevê û tevlêbûna amadekirina destûra nû ya Sûriyê de dixebitin.Çavkaniyan destnîşan kir ku şandeyê di civînan de tekez kiriye ku koalîsyona navnetewî wê herêmê ji hemû êrîşan biparêze. Her wiha şandeyê diyar kiriye ku ew bi awayekî cidî li saziyên ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatine ava kirin dinêrin û gotiye k ew çawa di aliyê leşkerî de şirîkê QSD'ê bûn niha jî gavên siyasî davêjin.
Her wiha Jeffrey diyar kir ku ew ê heta çareserkirina aloziya Sûriyê li herêmê bimînin û wê nehêlin tu aliyek mudexeleya van herêman bike û bi taybet herêmên ku QSD'ê bi hevkariya hêzên koalîsyonê rizgar kirine.

## Kesê piştî De Mistûra divê liser destûrke nû bixebite



Sîham Qeryo da zanîn ku divê kesê piştî De Mistura were erkdarkirin, destûreke ku nûneriya hemû gelên Sûriyê bike, ava bike.

Hevseroka Meclisa Giştî ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Sîham Qeryo di derbarê îstîfaya Nûnerê Neteweyên Yekbûyî yê Sûriyê Staffan De Mistura û kesê ku li şûna wî were erkdarkirin, de axivî.
Sîham destnîşan kir ku pêwîst e hemû pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tev li amadekirina destûreke nû j bo Sûriyê bibin û wiha got: "Divê kesê piştî De Mistura were erkdarkirin, destûreke ku nûneriya hemû gelên Sûriyê bike, ava bike."
Sîham wiha dewam kir: "Divê hemû cîhan rola QSD`ê ku ji hemû pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk tê, di rizgarkirina zêdetirî ji sedî 30 ji xaka Sûriyê ji dagirkeriya çeteyên DAIŞ`ê nas bike."
Hevseroka Meclisa Giştî ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê diyar kir ku dewleta Tirk bi rêya 'kaxizên sextê' hewl dide wan ji tevlêbûna xebatên siyasî yên navneteweyî dûr bihêle û wiha got: "Dewleta Tirk hewl dide ku rola Rêveberiyên Xweseriya Demokratîk a pêşeng û girîng a di bin banê Meclisa Sûriya Demoktaîk (MSD) de neyên dîtin."
Sîham bêdengiya navdewletî li hemberî dagirkirina Efrînê û kiryarên hovane yên li dijî welatiyên Efrînê jî şermezar kir.
Sîham Qeryo destnîşan kir ku dagirkirina dewleta Tirk a Efrînê, binpêkirina serweriya xaka Sûriyê ye û bi van gotinan dawî li nirxandina xwe anî: "Berjewendiyên aborî, leşkerî û siyasî yên di navbera dewletên herêmî û cîhanî de, dihêle ku li hember dagirkeriya Tirk li ser axa Sêriyê bêdeng bimînin. Berdêla vê yekê jî gelên Sûriyê didin."*ANHA*

## Bila Îmrali bê girtin, Ocalan azad bibe



Alîkarê Hevserokên Giştî yên ÎHD'ê Racî Bîlîcî diyar kir ku ji bo Tirkiye bibe welatekî demokratîk û ji bo jiyanek bi rûmet, divê girtîgeha Îmraliyê bê girtin û Ocalan azad bibe.
Tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dewam dike û nikare bi malbat û parêzerên xwe re hevdîtinê bike.
Alîkarê Hevserokên Giştî yên Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) yê li Tirkiyê Racî Bîlîcî têkildarî mijarê axivî.

**TECRÎD GEFEKE METIRSÎDAR E**

Bîlîcî da zanîn ku li girtîgehên Kurdistan û Tirkiyê binpêkirinê mafên mirovan di asta herî jor de ye û wiha axivî: "Li Îmraliyê binpêkirina mafên mirovan di asta jor de ye û ev binpêkirina mafên mirovan li hemû girtîgehên Tirkiyê vediguhere tecrîdê. Tecrîdkirina Birêz Ocalan li ser Kurdan gefeke metirsîdar e û ev tecrîd divê bi kêfa kesî neyê girankirin. Birêz Ocalan ne kesekî ji rêzê ye û kilîda aştiyê ya çareseriya pirsgirêka gelê Kurd e. Divê mirov bi du aliyan tecrîdê binirxînin. Birêz Ocalan divê bikare hemû mafên xwe yên weke, telefon, name, hevdîtina malbat, parêzer, rojname û televziyonê bi kar bîne. Ev yek mafekî rewaye."
Bîlîcî anî ziman ku tecrîd destpêkirina gelek pirsgirêkên bingehîn ê welêt in û wiha dewam kir: "Tecrîd dema kûr dibe, hevdîtin û diyalog tê birrîn, înkar û şidet kûr dibe. Di dawiya vê de jî binpêkirinên mafan dest pê dike. Eger tecrîd pêk neyê, rêyên diyalog û çareseriyê vebe, rêyên demokratîk vebe wê pirsgirêkên sereke yên vî welatî bên çareserkirin. Ya herî girîng wê şîdet bi dawî bibe û pirsgirêka Kurd bi rêya demokratîk çareser bibe. Wê bêhn bê ber Tirkiyê û hemû astengiyên li dijî ramanê wê rabe. Em ji vê bawer dikin û li gorî me jî ev çareseriyek mayînde ye."
Bîlîcî destnîşan kir ku ji bo jiyanek bi rûmet divê tecrîd ji holê rabe û wiha dewam kir: "Ji bo jiyanek bi hevre û di nava aştiyê de divê tecrîd demildest rabe. Tecrîd rabe wê dawî li krîza aboriyê û rageşiya Tirkiyê bê. Her wiha wê welat demokratîk be û nirx û rêgezên hiqûqê di asta jor de bi pêş bikeve. Mirovê ji her alî ve xwe ewle bibîne. Li Tirkiyê sedema hemû pirsgirêk û astengiya tecrîd e, lewma divê tecrîd rabe."
Bîlîcî nerazîbûn nîşanî biryara Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) da û got: "DMME'yê bi vê biryarê ji rêgez û armanca xwe dûr ketiye. Berî niha DMME li gorî rêgez û hevpeymanên navneteweyî tevdigeriya. Lê belê bi biryara Îmraliyê armanc û rêgezên xwe bê wate kir. Divê DMME nebe parçeyek ji siyaseta welatan û li gorî heq û hiqûqê tevbigre. Biryara DMME'yê siyasî ye û bûye parçeyek ji polîtîkayên Tirkiyê."
Alîkarê Hevserokên Giştî yê Komeleya Mafên Mirovan Racî Bîlîcî diyar kir, weke ÎHD daxwaz û banga wan, rojekê zûtir Girtîgeha Îmraliyê bê girtin û wiha axaftina xwe bi dawî kir: "Tecrîda girankirî ya li ser Birêz Ocalan rê li ber rageşiyên mezin vedike û bandorê li ser tevahiya girtîgehên Tirkiyê û Kurdistanê dike. Tecrîd tenê bandorê li girtîgehan nake, bandorê li tevahiya jiyanê dike. Gelek xalên civakê difetisîn e."…*ANF*

## Ala Şoreşa Cotmehê li Rojava li ba dibe



HBDH'yê salvegera Şoreşa Cotmehê silav kir û got, "ala şoreşê li Rojava li ba dibe."
Tevgera Şoreşê ya Yekbûyî ya Gelan (HBDH) ji ber salvegera Şoreşa Cotmehê daxuyaniyeke niviskî da.
HBDH'yê di daxuyaniyê de Monarşiya Çarlikê û dewleta Tirk da ber hev û got, "Dewleta Tirk a faşîst a dagirker, mêtinger ku ji bo gelên herêmê gefa herî mezin e, pergaleke zext û zordariyê ava kiriye ku ne kêmî ya rojên Monarşiya Çarlikê ya dema Şoreşa Cotmehê ye. Di serî de gelê Kurd, Laz, Çerkez, Ereb û civakên ji netewên din bi dewleta zilmê ya ku kiriye girtîgeh rê ve dibe. Lê ew jî tam weke efendiyên xwe emperyalîstan, li gel ku hemû zext û zordariyan nikarin asteng bikin ku têkoşîna çewisandiyan, bêriya li cîhaneke wekhev û bi xwîşk û biratî, agirê azadiyê yê Kurdistanê li Rojhilata Navîn berbelav bibe."

**ALA LI ROJAVA BELAV DIBE**

HBDH'yê bi berdewamî wiha got, ''Niha jî ala ku ji Şoreşa Cotmehê hatî girtin li Şoreşa Rojava li ba dibe. Bêrîkirina li cîhaneke azad, wekhev, bêsînor û bêçîn a xewnerojka Şoreşa Cotmhê li gel hemû êrîş û hewldanên fetisandinê jî li Rojava tê jiyandin. Niha jî peywira bi pêş de birina şoreşa nîvco mayî li ser milê Rojava ye. Weke hewcehiyeke pêgirîbûna li bîranînên şehîdan û xewnerojkên wan, ku ji bo rûmet, azadî û wekheviyê nemir bûne, ji bo cîhaneke bêsînor û bêçîn xwedîderketina li vê peyvirê li ber Şoreşa Rojava ye."

**EM XWEDÎ LI ŞOREŞA COTMEHÊ DERDIKEVIN**

HBDH'yê herî dawî got, ''Li dijî emperyalîst, mêtinger, dagirkeran, em mewziya serkeftî Şoreşa Rojava diparêzin, em bawer dikin ku geşkirina wê, parastina wê û anîna wê ya li siberojê tê maneya xwedîderketina li mîrateya Şoreşa Cotmehê ye."



# Ji bo Amed Ehmed kampayayê dest pê kir

**Ciwanê Efrînî Amed Ehmed ku 2 mehan bi neheqî li girtîgeha li bajarê Kleve yê Elmanyayê hate girtin û roja 17'ê Îlona 2018'an ji ber şewata li hucreya lê dima bi giranî birîndar bû, 29'ê Îlonê li nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest da. Ji bo kuştina Amed bê ronîkirin û berpirsyar werin darizandin, kampanyayekê dest pê kir.**




Beriya niha bi demeke kin, ciwanê Kurd Amed Ahmed ku bi neheqî hatibû destgîrkirin, ji ber xemsariya polîsên Elman li hucreya xwe ji ber şewatê miribû. Ji bo darizandina kesên ku berpirsyariya wan di mirina Ahmed de heye, kampanyayê dest pê kir.
Ciwanê Efrînî Amed Ahmed ku 2 mehan bi neheqî li girtîgeha li bajarê Kleve yê Elmanyayê hate hiştin û roja 17'ê Îlona 2018'an ji ber şewata li hucreya lê dima bi giranî birîndar bû, 29'ê Îlonê li nexweşxaneya Bochûmê ya lê dihate dermankirin, wefat kir.
Ji bo kuştina Ahmed bê ronîkirin û rayedarên Elman ên ku berpirsyariya wan di bûyerê de hene werin darizandin, kampanyayekê dest pê kir.
Kampanya ji aliyê saziyên civaka sivîl ve tê organîzekirin û pereyê di kampanyayê de bê hevdan wê ji bo pêvajoya hiqûqî bê bikaranîn.
Kampanyayê li ser malpera înternetê ya bi navê "gofundme.com" dest pê kir û aarmanca xwe ya destpêkê komkirina 10 hezar Euro ye. Di çarçoveya kampanyayê de di nava çend rojan de 2 hezar Euro alîkarî hate dayin.
Kesên ku dixwazin li ser kampanyayê agahiyê bigirin an jî alîkariyê bidin, dikarin bala xwe bidin vê adresa înternetê: https://www.gofundme.com/recht-skosten-amad

## Herekol wê ji dijmin re bibe goristan



Fermandar Egîd Garzan li ser êrîşên li dijî Herekolê axivî û got, "Dijmin tenê çû ser çend girî û li wir êsîr ma. Herekol wê her tim ji wan re bibe goristan."
Berxwedana gerîla ya li dijî êrîşên giran ên dewleta Tirk dewam dike. Fermandarê Herekolê Egîd Garzan êrîşên artêşa Tirk ên li ser Herekolê nirxand û da zanîn, artêşa Tirk li pêşberî berxwedana gerîla gelekî tengav bûye. Fermandar Egîd Garzan bal kişand ser rewşa nebaş a psîkolojîk a leşkerên Tirk û got, "Leşkerên Tirk di tarîtiya şevê de dema ku çav li kevirekî dikevin, ji tirsa gerîla bi sedan fîşekî li kevir direşînin. Rewşa psîkolojîk a leşkeran xera bûye."
Fermandar Garzan li ser şerê leşkerên Tirk û gerîla yê li Herekolê agahî da û wiha dewam kir: "Dijmin ji bo propagandayê dibêje 'Em ketine filan cihî, me filan cih kontrol kirine'. Lê belê operasyoneke wan a bi vî rengî li herêmê nîne. Dewleta Tirk mîna her carê şerê taybet dike."
Fermandar Egîd Garzan anî ziman ku 26'ê Tîrmehê êrîşa li ser Herekolê hinekî din hatiye berfirehkirin û wiha dewamkir: "Dijmin qadên Kulind, şehîd Sorxwîn û şehîd Canxurt kontrol kir. Bi vî rengî çû ser çend girî. Dijmin digot, 'Em ketine her devera Herekolê, me her der kontrol kirine', lê tiştekî bi vî rengî tine bû. Xwest bi rêya van derewan şerê taybet bike."
Fermandar Garzan bi bîr xist, ji roja ku dewleta Tirk li Herekolê dest bi operasyonê kiriye û vir ve gerîla çalakiyên xurt dikin û got, "Di çalakiyên gerîla de nêzî 40 leşker hatin kuştin. Dijimin dixwaze derba ku li Herekolê xwariye veşêre, lewma hejmara kuştiyên xwe jî nade. Me di vê operasyonê de jî dît, dewleta Tirk nikare li dijî gerîla şer bike. Leşkerên wan li ser sînor di nava tinebûnê de ne. Leşkeran di operasyonê de pişta xwe bi teknîkê û balafiran germ kirine. Ne ji balafirên keşfê be nikarin razên û rabin. Psîkolojiya leşkerên Tirk li pêşberî çalakiyên gerîla xera bûye. Li girê ku xwe gihandine ser, bi 100 metreyî jî nikarin bi pêş ve biçin. Li ser giran çikiyane."
Egîd Garzan işaret bi bandora gerîla ya li ser leşkerên Tirk kir û bi bîr xist ku 35 sal in ew têkoşîna çekdarî dikin: "Me daxuyaniyên dijmin jî şopand. Dibêjin, 'Herekol ji bo me cihekî stratejîk e'. Bi salan e bi vê rêbazê tevdigerin. Ji bo gerîla her çiyayekî Kurdistanê stratejîk e û haya dijmin ji vê heye. Dijminê ku dixwaze bi propaganda gemarî vî şerî bidomîne, nikare bikeve nava Herekolê."
Fermandarê Garzan diyar kir, artêşa Tirk mehekê li ser çend girî ma û 40 leşkerên wan hatin kuştin û got, "Hevalan li girê Şehîd Berxwedan çalakiyek kirin û hemû leşkerên li wir reviyan. Dijmin dest ji wî girî berda û reviya cihekî din. Dijmin ber çalakiyên gerîla nikare bi rehetî li çiyayên Kurdistanê be."Fermandar Egîd Herekol li ser propaganda gemarî ya dewleta Tirk û medyaya wê axivî û got, "Gerîla niha li hemû çiyayên Kurdistanê derbên giran li dijmin dixîne. Dewleta Tirk jî vê rastiyê ji raya giştî vedişêre."
Fermandarê Herekolê Egîd Garzan diyar kir, bi operasyona Herekolê re hatiye fêhmkirin ku dijmin nikare çiyayên Kurdistanê kontrol bike û herî dawî got, "Herekol wê di vê operasyonê de jî ji wan re bibe goristan. Gerîlayên azadiyê wê li dijî êrîşên dijmin timî xwe biparêzin."

## Zarokan sedemên tevlîbûna xwe ya nava DAIŞ'ê vegotin

Zarokên ku DAIŞ'ê xapandibûn sedemên tevlêbûna xwe ya nav refên DAIŞê de vegotin. Zarokan diyar kirin ku piştî tev li DAIŞ'ê bûne poşman bûne, lê belê ji ber tirsa kuştinê nekarîne xwe jê xilas bikin.
Komîteya Têkiliyên Giştî ya Hêzên Sûriya Demokratîk bi însiyatîfa Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, beriya niha bi du rojan 102 kes ku bi sûcê endamtiya DAIŞ'ê hatine tawanbarkirin, serbest berdan.



Di vê çarçoveyê du zarokên bi navên Mihemed Necar û Ebdulmudahî Hamadî ku tev li DAIŞ'ê bûbûn behsa xwe kirin.
Mihemed Necar 18 salî ye û ji bajarê Helebê ye. Di sala 2016'an de tev li DAIŞ'ê bûye. Yanî dema ku 16 salî bû tev li nava refên DAIŞ`ê bû.
Mihemed Necar sedemên tevlêbûna xwe wiha rave kir: "DAIŞ'ê herêma me dagir kir, kêmbûna rêjeya bêkariyê û ji bo ku em debara malbatên xwe bikin ez û birayekî xwe tev li DAIŞ'ê bûn."
Necar wiha got: "Tevî temenê min ê biçûk min di eniyên şer de cihê xwe digirt. Lê zarokên dewlemendan û serçeteyan di rêveberiyan de bûn. Lê ciwanên xizan di xendekan de bûn."
Mihemed Necar dema tevlêbûna wî di nav refên DAIŞ'ê de, bûbû şahidê zilma DAIŞ'ê ya li dijî sivîlan û wiha dewam kir: "Ji me re her tim behsa ol, cîhad û şerê li dijî kafiran dikirin. Lê piştî tevlêbûnê min berovajî wan îdiayan dît."
Necar rêwîtiya koçberkirinê ji Heleb û Reqa heta Dêrazorê dewam kiriye, di dawiyê de tevî birayê xwe, xwe radestî Hêzên Sûriya Demokratîk kiriye. Necar diyar kir ku danûstandina QSD'ê bi wan re baş bû û ji bilî wê danûstandinê û teşwîqkirina avakirina civakê nedîtin.
Ebdulmudahî Hamadî yê 17 salî ji bajarê Dêrazorê ye. Ji bo qezenckirina pereyan, beriya 2 salan tev li nava refên çeteyên DAIŞ'ê bûye. Yanî wê demê temenê wî 15 salî buye.
Ebdulmudahî li ser tevlêbûna xwe ya nava DAIŞ'ê got: "Piştî ku li mizgeftê bi hinceta cîhadê em teşwîqî tevlêbûnê dikirin, min ji wan bawer kir û paşê ez ji nav sûkê birim. Wê demê tevî komeke ji 20 kesan em tev li DAIŞ'ê bûn."
Dema ku Ebdulmudahî, ji bo mehekê tev li dewreya perwerdeya leşkerî ya bikaranîna çekan bû. 2 birayên Ebdulmudahî di nav refên QSD'ê de şehîd bûne. Ebid El-Mudahî diyar kir ku haya wî ji vê yekê hebû û wiha got: "Min ev tişt dizanibû. Lê DAIŞ'ê her kesê ku direvî digirt, îşkence lê dikir û hin caran jî dikuşt. Ji ber wê ez ditirsîm ku birevim."
Hemadî bi bîr xist ku piraniya fermendarên wan ji çeteyên biyanî bûn, qaşo bi navê El-Muhacirîn tên binavkirin. Emîrê koma wî Tunisî bû.
Ciwanê bi navê Ebd El-Mudahî Hemadî tevî malbata xwe ji herêma Dêrazorê beriya salekê bi rêya qaçaxciyekî reviyan û xwe gihand herêmên di bin parastina QSD'ê de. Têkildarî dema girtina wî li gel QSD'ê Ebd El-Mudahî wiha got: "Di vê demê de ez tev li Navenda Hûrî ya Çand û Hunerê bûm. Min gelek sûd ji waneyan wergirt. Ez pê nehesiyan ku ez xerîb im. Ez spasiya keda wan ji bo guhertina kesayeta xwe dikim."…*ANHA*

## Çeteyên DAŞ û dadgehkirina wan



Mihemed SEYDÎ

Têkoşîna li dijî çeteyên DAIŞ'ê didome. Li herêmên herî dawî yên di destê çeteyan de şerê giran rû didin. Roj bi roj çeteyên DAIŞ'ê di warê cografî de têk diçin. Heta niha bi sedan çeteyên DAIŞ'ê hatine dîl girtin, û hîne jî sax tên girtin. Bi dehan ji wan li xwe mikurhatin ku çawa û kê havkarî bi wan re kiriye û desteka gelek dewletan pê re derdikeve holê. Ne tenê destek, di avakirina wan de jî eşekre dibe.
Di daxuyaniyên rêveberiya xweswer yên herî dawî, dîsa ya hêzên li bakurê Sûriyê de hat gotin, heta niha zêdetirî 800 çeteyên DAIŞ'ê yên biyanî ji zêdetirî 40 welatî di destê wan de dîl girtîne. bang li van welatên ku hemwelatiyên wan tevlî çeteyên DAIŞ'ê bûbûn û niha li gel QSD'ê ne hate kirin ku li hember van hemwelatiyên xwe berpirsyariyên xwe pêk bînin..
Hin caran behse dadgehkirin van çeteyan li dadgehên bakurê Sûriyê tê kirin. lê wê çawa li vir werin dadgehkirin û heta niha bi rengekî fermî rêveberiya li vir û dadgehên wê li qadên navnetewî nehatiye naskirin. Ji naskirinê wêdetir li vir di nava vê aloziyê de wê çawa misogeriya girtina wan çêbibe ku her roj gef û êriş li ser van herêman hene. Hin alî dibêjin ku bila dadgeh bikin û wan li wir bikujin. Ê başe ger werin dadgehkirin jî li dadgehên bakurê Sûriyê cezayê Îdamê tuneye. Wê çawa werin kuştin û li gorî kîjan qanûnê.
Hêzên li bakurê Sûriyê karîbû xeteriya çeteyan li ser Dûnyayê bê bandor bikin, ma wê belaya dadgehkirin û zîndankirina wan jî bigrin ser milê xwe? Ma ev edalete?
Xaleke din jî em balê bikşînin ser ew e ku ger ev welat bibêjin temam em hemwelatiyên xwe yên DAIŞ'î dixwazin û em ê li gel xwe dadgeh bikin jî wê çawa werin dadgeh kirin û li gorî çi qanûnan werin dadgehkirin. Ma ne divê ev jî were pirsîn.
Gelek Çeteyên DAIŞ'ê yên ji herêmê jî hene, bi taybet ji Sûriyê û Îraqê û gelek deverên din. ji wan gelekan xwe gihandine Ewrûpa û wêne û dîmenên xwe jî li ser Tevna Civakî belav dikin. Ji gelek êrişên ku van çeteyan li Ewrûpa pêk anîn jî ne hemwelatiyên ewrûpa ne. Yanî wê kî û li gorî çi ev werin dadgehkirin..
Mînak; em Dewleta Tirk bidin. Bi sedan welatiyên Tirkiyê yên tevlî DAIŞ'ê bûbûn hene. Ger yên di destê QSD'ê de ji bo wan werin radestkirin wê çawa bibe . ma ne hemû belge û delîlên li ber destan eşkere dikin ku dewleta Tirk çiqas di avakirin û hevkariya bi DAIŞ'ê re cih girtiye. Sibê ne dûr be dîsa dewleta Tirk van çeteyan ji zîndanan derbixe û bike belaya serê cîhanê.
Berî çend rojan welatiyekî Alman jî ku tevlî DAIŞ'ê bûbû û ew di destê hêzên QSD'ê de ye bang li Hikumeta welatê xwe dikir da ku wî bibin. Ê Almaniya ji bo wê çikir?. Franca ya ku berê gotibû baweriya wan bi dadgehên bakurê Sûriyê tê û dikarin çeteyan li wir dadgehbikin, niha dibêje: em ê zarokên ku bi eslê xwe Francî ne bibin lê dayîkên wan na.
Ya ku em dixwazin balê bikşînin ser ew e ku mijar bi dadgehkirina her çeteyekî li welatê wî wê ne çareserî be...
Ji bo ev çete werin dadgehkirin û li gorî xeteriya wan ceza li ser wan were birîn, dive dadgeheke navnetewî were avakirin ku yên girtî dadgeh bike û yên xwe gihandine deverên Ewrûpa û li ser Tevna Civakî wêneyên xwe parve dikin jî bêne şopandin û girtin..
Tenê bi vê gave em dikarin bibêjin xeteriya çeteyên DAIŞ'ê yên girtî kêm dibe…